# Hevjînî û zarok

Hevjînî
Maf û berpirsyariyên dêûbavan
Dêûbav bûn
Lênêrîna zarokan / Mayîna li ber zarokan
Gihiştina hev a endamên malbatê
Nakokî (pevçûn)

# Hevjînî

Li swîsreyê gelek awayên jiyana bi hev re ya mirovan hene. Gava hûn bixwazin bizewicin (şû bikin), divê hûn herî kêm 18 salî bin. Her du hevjîn xwediyê heman mafan in.

## Jiyana bi hev re

Li Swîsreyê di dehsalên dawî de gelek guhertin pêk hatine. Gelek caran kesên dibin cot, tevî ku ne zewicî bin jî, bi hev re dijîn (Bihevremayîna bê peymana fermî-Konkubinat). Zarokên van cotan bi hev re çêkirine jî hene. Di navbera cotên wiha de parvekirina rolan a hişkehişk tine ye. Ev tê wê wateyê, ku jin û mêr di vê têkiliyê de ne mecbûr in erkên diyar bigirin ser milên xwe.
Cotên ji heman zayendê jî dikarin bi hev re bijîn, wek mînak mêrek bi mêrekî re, jinek bi jinekê re. Ew wek cotên din xwediyê heman mafan in û dikarin bi hev re bizewicin jî.

## zewac / şûkirin

Hûn dikarin li Swîsreyê destpêkê ji 18 saliyê ve bizewicin. Cotên ji heman zayendê jî dikarin bizewicin: Mêrek dikare bi mêrekî re bizewice û jinek dikare bi jinekê re bizewice. Gava hûn bixwazin bizewicin, divê hûn serî li Saziya Rewşa Sîvîl a Basel-Stadt (Zivilstandsamt) bidin. Saziya Rewşa Sîvîl "pêvajoya amadekariya zewacê" dide destpêkirin. Bi vê pêvajoyê re wê zewac were amadekirin. Wek mînak sazî lê dipirse, bê her du hevjîn dikarin bizewicin. Gava pêvajo bi dawî bibe, divê hûn di nava sê mehan de bizewicin. Saziya rewşa sîvîl we li ser birêveçûna awayê pêvajoyê û belgeyên pêdiviya we pê hene, agahdar dike.
Dibe ku hevjînek hîn li derveyî welêt dijî. Divê hûn daxwaznameyekê pêşkêş bikin, ku hevjîn karibe were Swîsreyê (Amadekariya zewacê). Piştre hûn dikarin her du li vir, li Swîsreyê bizewicin (mehra xwe bibirin).
Dibe ku saziya rewşa sîvîl guman bike, da hûn zewaceke li ser kaxezê (Scheinehe) dikin. Zewaca li ser kaxezê tê vê wateyê: Hûn zewacê tenê ji bo hevjînek karibe li Swîsreyê bijî, dikin. Wê demê Saziya Rewşa Sîvîl dikare zewacê nepejirîne. Ger hûn ji xwe zewicî bin, sazî dikare vê zewacê wek nederbasdar diyar bike. Êdî zewac dîsa tê betalkirin. An jî dibe ku ji ber vê zewaca sexte, hûn mafê destûra mayîna xwe ji dest bidin.

## Maf û berpirsyarî

Hevjîn li gor zagonê xwediyê heman maf û berpirsyariyan in. Hûn di zewacê de xwediyên mafên wekhev in. Divê her du hevjîn bi dilxwazî bizweicin. Di rewşa zewaca bi darê zorê de (Zwangsheirat) ji bo bizewice zor li kesekê, kesekî tê kirin. Gava rayedar bi vê yekê bihisin, ew dikarin zewacê betal bikin, ne derbasdar diyar bikin. Kesên ji bo bizewicin zorê li kesên din bikin, tên cezakirin.
Hûn hest pê dikin, ku ji bo bizewicin zor li we tê kirin? Ciyê şêwirmendiya zewaca bi darê zorê (Beratungsstelle zwangsheirat.ch) wê alîkariya we bike. Telefonkirin belaş e. Jimara televonê ev e: 0800 800 007

## Plansaziya malbatî

Pirsên we ji bo plansaziya malbatî, ducanîbûn an zayendê hene? Li kantona Basel-Stadt ji bo vê ciyên şêwirmendiyê hene. Ev cî li ser gelek mijaran agahiyan didin, wek mînak bergirtin, pirsgirêkên zayendî, tenduristiya zayendî, nexweşiyên cinsî yan jî ger hûn bê daxwaza xwe ducanî bûbin. Ger hûn li hêviya zarokekê bin an zarokeke we hebe jî, ew şêwirmendiya we dikin.

## Hevberdan

Hûn zewicî ne lê dixwazin hev berdin? Wê demê hûn dikarin daxwaza hevberdanê li ba Dadgeha Sîvîl a Basel-Stadt (Zivilgericht) bikin. Hûn dikarin daxwaza hevberdanê bi tenê jî bikin. An jî, hûn dikarin daxwaza hevberdanê bi hevjîna, bi hevjînê xwe re bi hev re bikin.
Hûn li derveyî welêt zewicîne? Dîsa jî, hûn dikarin li gor zagonên Swîsreyê daxwaza hevberdanê bikin. Lê ji bo vê yekê, divê hûn herî kêm salekê li Swîsreyê rûniştibin. Û divê Swîsre welatê we yê sereke yê niştecîbûnê be. Gava hûn daxwaza hevberdanê bikin, rewşa mafê mayîna we, dikare were guhertin. Dibe ku piştî hevberdanê, hûn êdî nema karibin li Swîsreyê bijîn. Hûn niha di pêvajoya hemwelatîbûnê de ne? Dibe ku piştî hevberdanê êdî hûn nema karibin bibin hemwelatiyên Swîsreyê.
Gelo hûn dikarin piştî hevberdanê li Swîsreyê bimînin? A herî baş ji ciyekî şêwirmendiyê ya ji bo hevjîn û malbatan an jî ji ciyekî şêwirmendiya hiqûqî bipirsin. Ger hûn qurbaniyên zordariya navmalê ne, wê demê rêzgirên taybet hene.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/partnerschaft

# Maf û berpirsyariyên dêûbavan

Gava zarokeke we çêbibe, divê hûn bi lez çêbûnê ragihînin Saziya Rewşa Sîvîl. Gava hûn zewicî bin, mafê lênêrîna zarokan ji xwe bi awayekî otomatîk di zagonan de hatiye diyarkirin. Gava hûn nezewicî bin, divê hûn bi xwe li ser mafê lênêrîna zarokê rawestin.

## Qeyda jidayikbûnê

Divê hûn jidayikbûna her zarokekê li ba Saziya Rewşa Sîvîl (Sivilstandamt) bidin qeydkirin. Baldar bin: Divê hûn biçin Saziya Rewşa Sivil a ciyê zaroka we lê çêbûye. Dibe ku, navê hûn biçin saziya li şaredariya hûn lê rûdinin.
Zarok li nexweşxaneyê hatiye ser ruyê erdê:
Nexweşxane belgeyan dişîne Saziya Rewşa Sîvîl. Êdî hewce nake hûn bixwe li ser rawestin.
Zarok li nexweşxaneyê nehatiye ser ruyê erdê:
Dibe ku we zaroka xwe li malê yan li ciyekî din anîbe ser ruyê erdê. Divê hûn wê demê bi xwe jidayikbûna zarokê ragihînin Saziya Rewşa Sivil. Ji bo vê 3 roj dema we heye. Saziya Rewşa Sîvîl wê ji we re bibêje, bê divê hûn kîjan belgeyan bidin wan.
Zanîna vê baş e:
Zarokeke li Swîsreyê jidayik bibe, ew ji ber vê yekê nabe Swîsrî. Ew bi awayekî otomatîkî hemwelatiya Swîsreyê nastîne.

## Nasîna fermî ya bavbûnê

Hûn zewicî ne û ji we re zarokek çêbû:
Hevjînê we wê rasterast wek bav were qeydkirin. Dibe ku hevjînê we zen dike, ku ew ne bavê zarokê ye. Wê demê, ew dikare here dadgehê û bavîtiyê nepejirîne.
Hûn ne zewicî ne û ji we re zarokek çêbû:
Bavê zarokê wê bi awayê otomatîk wek bav neyê qeydkirin. Ew dikare berî yan piştî jidayikbûnê here Saziya Rewşa Sîvîl û bixwaze zarokê bigire ser navê xwe. Dibe ku bav naxwaze zaroka xwe bigire ser navê xwe. Wê demê dayik dikare serî li dadgehê bide û bixwaze, ku bav zarokê bigire ser navê xwe.

## Berpirsyariya Dêûbavbûnê

Wek dê û bav, divê hûn li zarokên xwe binêrin, ku rewşa wan baş be. Ev yek maf û berpirsyariya we ye (berpirsyariya dêûbavbûnê, elterliche Sorge). Wek mînak, divê hûn zarokên xwe mezin bikin û lêçûna jiyana zarokên xwe bidin. Ji bilî van, heta zarokên we dibin 18 salî, divê hûn berpirsyariya wan a zagonî bigirin ser xwe.
Hûn zewicî ne:
Hûn her du li hember zarokên xwe xwediyê heman mafan û heman berpirsyariyan in.
Hûn nezewicî ne:
Divê destpêkê bav zarokê bigire ser navê xwe. Piştre hûn her du dikarin bi awayekî dildarî û nivîskî rave bikin, ku hûn dixwazin bi hev re zaroka xwe mezin bikin (gemeinsame elterliche Sorge). Hûn dikarin vê yekê, gava bav li ba saziya rewşa sîvîl zarokê bigire ser xwe, bikin. Yan jî hûn dikarin piştre biçin ba Rayedariya Parastina Zarokan, (Kindesschutzbehörde, KESB). Gava we ji bo mafê mezinkirina zarokê li hev nekiribe, Rayedariya Parastina Zarokan biryarê dide.
Ger pirsên we hebin an pêdiviya we bi alîkariyê hebe, hûn dikarin biçin ciyekî şêwirmendiya malbatan.

## Debarî (nefeqe)

Gava hûn ji hev veqetiyayî bin, dîsa jî, divê hûn her du alî li zarokên xwe binêrin. Hûn dikarin bi hev re biaxivin, bê kî li zarokê binêre û kî çiqas pere bide (Debarî-nefeqe - Unterhalt).
Hûn her du bi hev re debariya zaroka xwe didin. Dibe ku hûn kêm an zêdetir ji aliyê din ê dêûbav bidin. An jî, dibe hûn qet nedin. Ev yek girêdayî hatineya we ye, bê hûn çiqas pere bidest dixin û çiqasî ji bo lênêrîna zarokê vediqetînin. Gava hûn bi aliyê din ê dêûbav re li hev nekin, hûn dikarin serî li dadgehê bidin.
Aliyek ji dêûbav pereyê pişka xwe nade:
Gava yek ji aliyên dêûbav pereyê pişka xwe yê ji bo zarokê nede, hûn dikarin ji şaredariya lê rûdinin alîkariyê bixwazin. Şaredariya hûn lê rûdinin alîkariya we dike, ku hûn pere bistînin. Gava we pere heq kiribe, dibe ku ew wê wek debarî (nefeqe) bidin we. Ji vê re dibêjin Alimentenbevorschussung.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/rechte-und-pflichten-der-eltern

# Dêûbav bûn

Mezinkirina zarokekê ne hêsan e. Dibe ku hûn carinan ji xwe dipirsin, bê ka ji bo zarokê çi baş e. Axavtina bi malbatên din re dikare pir alîkar be. Wekî din, gelek ciyên şêwirmendiyê dikarin alîkariya we bikin.

## Warên hevdîtinê

Ji bo dayik û bavan gelek derfet hene. Hûn dikarin bi dayik û bavên din re biaxivin an bi zarokên xwe re bi hev re dema xwe derbas bikin.

- Komên pitikan (Krabbelgruppen) ji bo pitik û zarokên biçûk ên heta 2 salî ne. Hûn dikarin li vir dayik û bavên din nas bikin.
- Jîmnastîka dêûbav û zarokan (MuKi-Turnen, VaKi-Turnen an jî ElKi-Turnen) ji bo dêûbavên tevî zarokên biçûk in. Hûn dikarin bi hev re bilîzin, bilivin û dilxweş bibin. Piraniya şaredariyan derfetên wiha yên jîmnastîkê (Turnen) pêşkêş dikin.
- Warên hevdîtina li taxê (Quartiertreffpunkte) ji bo dêûbav û zarokan gelek derfetan pêşkêş dikin.
- Pirtûkxane û pirtûkgehên lîstokan derfetan didin pêş zarokên biçûk û yên mezin û dayik û bavên wan.

## Perwerdehiya dêûbavan

Li Basel-Stadt kursên ji bo dêûbavan ên li ser gelek mijarên cihêreng hene. Ji bo koçberan kursên taybetî jî hene. Wek mînak kursên li ser sazûmana perwerdehiya Swîsreyê hene. Hinek kursên bi zimanên din jî hene.

## Şêwirmendiya perwerdehiyê

Gava pirsên we yên ji bo perwerdeya zarokên we hebin, gelek ciyên şêwirmendiyê alîkariya we dikin.
Wek mînak, gava pitikên we û zarokên we yên heta 5 salî hebin, hûn dikarin biçin ba şêwirmendiya dêûbavan (Elternberatung).
Ger pirsên we yên lezgîn hebin telefonî xeta lezgîn a ji bo dêûbavan (Elternnotruf) bikin. Li vê derê mirovên pisporên beşê wê şêwirmendiya we bikin. Gava hûn telefonê bidin, lêçûna we wê wek lêçûna telefona malê be. Jimara telefonê ev e: 0848 35 45 55. An jî hûn dikarin e-mailekê bişînin. Hûn dikarin navnîşanan li ser malpera www.elternnotruf.ch bibînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/eltern-sein

# Lênêrîna zarokan / Mayîna li ber zarokan

Gelek dayik û bav piştî jidayikbûna zarokê jî dixebitin. Ji ber vê yekê li kantona Basel-Stadt ji bo lênêrîna zarokan derfetên taybetî hene. Ji bo piraniya derfetan, divê hûn lêçûna wê bidin.

## Ciyê lênêrîna zarokan a rojane

Li ciyê lênêrîna zarokan a rojane wê seranseriya rojê li zarokên we binêrin. Navê ciyê lênêrîna zarokan a rojane bi kinayî Kîta ye. Piraniya Kîta ji sê saliya zarokê heta destpêkirina xwendegehê li zarokan dinêrin. Hinek Kîta li zarokên diçin xwendegehê jî nîvro û piştî xwendegehê dinêrin.
Ji ber lîsteya libendemayînê pir dirêj e, divê hûn zaroka xwe pir ji zû ve bidin qeydkirin. Buhayê Kîtayan cihêreng e. Hinek şaredariyên hûn lê rûdinin, ji bo hinek Kîtayan qismek ji buhayê wê didin. Hûn dikarin ji Kîta û ji şaredariya xwe bipirsin, bê buhayê wê çendî ye û hûn çawa dikarin zaroka xwe bidin qeydkirin.

## Komên lîstikan

Gelek zarok berî dest bi xwendegehê bikin, tev li komeke lîstikan (Spielgruppe) dibin. Zarok li nav koma lîstikan derdora sê salan bê dêûbavê xwe tên ba hev. Lênêreke jin a xwende bi zarokan mijûl dibe. Wek mînak zarok karên bi dest dikin û bi hev re dilîzin. Koma lîstikan bi dildarî ye.
Zaroka we li malê bi almanî naaxive? Wê demê, ew dikare li nav koma lîstikan dest bi hînbûna almanî bike. Bi vê riyê, gava ew dest bi xwendegehê bike wê hînbûn ji zaroka we re hêsantir be.

## Lênêrîna rojane / sifreya nîvro

Li hemû xwendegehên seretayî û navîn li avayiya xwendegehê yan jî pir li nêzî wê lênêrîna rojane (Tagesstrukturen) heye. Lênêrîna rojane tê wateya, ku zarok wê nîvro li xwendegehê bimîne û wê firavînê li wir bixwe. Piştî xwendegehê kesek li zarokan dinêre û zarok dikarin li wir karê xwe yê malê çêkin.
Hûn dixwazin zaroka we biçe lênêrîna rojaneyê? Wê demê, divê hûn buhayê wê bidin. Buhayê wê girêdayî rewşa we ya aborî ye. Zarok dikare di hefteyê de rojekê yan gelek rojan biçe ba lênêrîna rojaneyê.

## Malbatên lênêrîna rojane

Hûn dikarin zaroka xwe deynin ba malbateke lênêrîna rojane jî. Malbateke lênêrîna rojane (Tagesfamilie) malbatek e, ku zarok seranseriya rojê yan jî berî û piştî xwendegehê li ba wê dimîne. Ciyên navbeynkariyê ji bo dîtina malbateke lênêrîna rojane ya li gorî we, alîkariya we dikin. Ciyên navbeynkariyê li ser buhayê asayî yê malbateke lênêrîna rojane jî agahiyan didin we.

## Lênêrîna pitikan / Rewşên lezgîn

Li Swîsreyê ciwan jî dikarin êvaran an dawiya hefteyê wek lênêrên pitikan bixebitin. Ciwan ji bo wê pere distînin. Lîsteyeke Xaça Sor a Swîsreyê ya Basel-Stadt (SRK) ya navê cihên navbeynkariyê yên ji bo lênêrên pitikan, ku berê tev li kursekê bûne, heye.
Lênêrîna zarokan a di rewşên lezgîn de
Dibe ku rewşeke lezgîn hebe û pêdiviya we bi lez bi keseke li zaroka we binêre çêbibe. Wek mînak: Divê hûn an hevjîna we, hevjînê we biçin nexweşxaneyê û keseke li ber zaroka we bimîne tine ye. Lênêrîna zarokê ya rewşa lezgîn a Xaça Sor a Swîsre ya Basel-Stadt (SRK) heye. Divê hûn ji bo lênêrînê buhayê wê bidin. Lê belê hinek sîgortayên tenduristiyê buhayê wê digirin ser xwe.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/kinderbetreuung

# Gihiştina hev a endamên malbatê

Gava hûn li Swîsreyê dijîn, kesên ji malbata we jî dikarin werin Swîsreyê. Ji bo wê, divê şertûmercên diyar werin cî. Hûn dixwazin xizim an nas werin serdana we li Swîsreyê. Wê demê, divê hûn carinan daxwaza vizeyeke hatinê bikin. Ev yek girêdayî welatê mêvanê we jê tê ye.

## Gihiştina hev a endamên malbatê

Gava hûn li vir dijîn, dibe ku xizmên we yên yekser an hevjîna we, hevjînê we were Swîsreyê (Gihiştina hev a endamên malbatê - Familiennachzug) Hûn dikarin ji bo kîjan endamên malbata xwe daxwaznameyekê bidin? Ev yek girêdayî, bê hûn hemwelatiyê ku derê ne û kîjan awayê mafê destûra we ya mayînê heye. Dibe ku malbata we jî bi pey we re karibe were, ger hûn tenê bi demborî hatibin qebûlkirin û nasnameyeke we ya F hebe.
Saziya Koçberiyê (Migrationsamt) biryarê dide, bê malbata we dikare were. Saziya Koçberiyê agahiyê dide we, bê divê hûn çi bikin û pêdiviya we bi kîjan belgeyan heye.
Baldar bin:
Divê hûn daxwaza gihiştina hev a endamên malbata xwe di demeke diyar de pêşkêş bikin. Dema wê ji bo zarokan kintir e, ji ya ji bo kesên mezin, wek mînak ji bo hevjîna we, hevjînê we.

## Amadekariya zewacê

Hûn li Swîsreyê rûdinin û dixwazin ji derveyî welêt bi kesekê re, bi kesekî re bizewicin? Wê demê, hûn dikarin ji bo hatina wê/wî destûrê bixwazin, ji bo hûn karibin amadekariya zewacê bikin (Vorbereitung der Heirat). Bi vê riyê hevjîna we, hevjînê we dikare berî zewacê were Swîsreyê û hûn dikarin li vê derê bizweicin.
Saziya Koçberiyê (Migrationsamt) biryarê dide, bê hevjîna we, hevjînê we dikare were. Sazî we agahdar dike, bê divê hûn çi bikin û pêdiviya we bi kîjan belgeyan heye.

## Vîzeya hatinê

Xizim an nasên we yên ji welatê we dixwazin werin serdana we li Swîsreyê? Wê demê pêdiviya wan bi vîzeyeke hatina Swîsreyê heye. Bi piranî bidestxistina vîzeyekê ne wisa hêsan e. Carinan, divê mêvanên we nameyeke vexwandinê ya we nivîsiye, pêşkêş bikin. An jî, divê mêvanên we bawerîdar bikin, ku ew dikarin lêçûnên xwe bi xwe bidin (Ravekirina hilgirtina berpirsyariyê - Verpflichtungserklärung).
Konsolxaneya Swîsreyê ya li derveyî welêt biryarê dide, bê ew kes vîzeyê bistînin. Konsolxane agahiyan dide, bê divê mêvanên we çi bikin û pêdiviya wan bi kîjan belgeyan heye. Hûn dikarin li ba saziya koçberiyê (Migrationsamt) jî agahiyan bistînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/familiennachzug

# Nakokî (pevçûn)

Di nav malbatê de yan bi hevjîna we, bi hevjînê we re nakokiya we heye, yan hûn pev diçin? Wê demê gelek ciyên şêwirmendiyê alîkariya we dikin. Zordariya li nav malbatê û di navbera hevjînan de qedexe ye. Li ser malpera «Silav Basel-Stadt» sergotarek ji bo _zordariya navmalê_ heye. Li wê derê hûnê agahiyên zêdetir ên li ser vê mijarê bibînin.

## Nakokiya di navbera hevjînan de

Gava pirsgirêkên we yên bi hevjîna we re, bi hevjînê we re hebin, hûn dikarin ji kesên pisporên beşê alîkariyê bistînin (şêwirmendiya hevjînan, Eheberatung). Ciyên taybet ên şêwirmendiyê yên bi we re li çareseriyekê bigerin, hene. Bi piranî axavtina destpêkê belaş e yan jî, divê hûn kêmek heqdestê wê bidin.

## Nakokiya li navmalbatê

Gava zarokên we hebin, dikare carinan rewşên zehmet rû bidin. Ev wek dêûbav ji bo we û ji bo zarokên we giraniyê çêdike. Ya baş gava hûn nema dizanin çi li pêşiya we ye, ji bo xwe alîkariyê bixwazin .
Alîkariya ji bo dayik û bavan

- Li ciyê şêwirmendiya malbatan (Familienberatungsstelle) ji bo we şêwirmendiya şexsî dikin.
- Ger pirsên we yên li ser perwerdeyê hebin yan hûn xema zarokên xwe dixwin, hûn dikarin serî li banga lezgîn a dêûbavan bidin. Li vê derê ji aliyê kesên pisporên beşê ve wê şêwirmendiya we were kirin. Jimara telefonê: 0848 35 45 55 e. (Lêçûna wê li gorî tarîfeya telefona malê ye) Wekî din hûn dikarin bi riya e-mailê jî serî lê bidin.

Ji bo zarok û ciwanan:

- Zarok û ciwan dikarin telefonî banga lezgîn a zarokan bikin, e-mailekê yan peyamekê (SMS) binivîsin an jî chat bikin. Jimara telefonê: 147 e (û telefonkirin belaş e).

## Zordariya navmalê

Zordariya navmalê sûcekî hiqûqî ye û nayê qebûlkirin. Gava kesek zordariyê bike, ew xwe sûcdar dike. Her awayê zordariyê qedexe ye. Kesek nikare zordariyê li hember keseke din, kesekî din ê malbatê bi kar bîne: ne li hember hevjîna xwe, hevjînê xwe û ne jî li hember zarokan. Gava rayedar bi zordariya navmalê bihisin, divê ew dest biavêjinê. Li nav malbatê zordarî li we tê kirin? Derfeta hûn alîkariyê bistînin heye. Ev derfet belaş û bawerîdar e.

- Frauenhaus / Väterhaus: Gava jin an mêr li rastî zordariyê werin, ew dikarin ji bo demeke diyar biçin mala jinan an mala bavan. Hûn dikarin bi zarokên xwe re li wir daxwaza parastinê bikin. Jin dikarin şev û roj telefonî mala jinan bikin. Telefon: 06 681 66 33.
- Banga lezgîn a zarokan: Zarok û ciwan dikarin telefonî banga lezgîn a zarokan bikin. Telefonkirin belaş e. Jimara telefonê: 147 e.
- Hûn hest pê dikin ji aliyê keseke, kesekî ji malbata we ve gef li we tê xwarin? Wê demê telefonî polîsan bikin. Jimara telefonê: 117 ye. Polîs dikare kesa, kesê sûcdar ji bo demeke dirêj ji malê yan ji avahiyê dûr bihêle. Wê demê kesa, kesê sûcdar nema dikare were malê yan avahiyê.

Li ser malpera «Silav Basel-Stadt» sergotarek bi navê «zordariya navmalê" heye. Hûn dikarin li wir agahiyên zêdetir bibînin.

## Agahiyên zêdetir (Girêdank, Navnîşan, Broşur, Belavok)

www.hallo-baselstadt.ch/ku/partnerschaft-und-kinder/konflikte